# Cemal Nebez Xelata

**Coordinator/Organiser: Fexriye Adsay**

**Haci Akman** xelkê Bakurê Kurdistanê ye û welatiyê Norwêcê ye. Ew Profesorê Lêkolînên Çandî ye li Zanîngeha Bergen, beşên Arkeolojî, Dîrok, Lêkolînên Çandî û Ol. Wî bi zimanên norwêcî û îngilîzî gelek berhem belav kirine. Lêkolînên wî li ser koçberî, etnîsîte, dîaspora û mîrata çandî disekinin.

**Veman Lineva** xelkê Duhokê ye û welatiyê Norwêcê ye. Wê bawernameya bekelorya di warê çand û zanist de û bawernameya masterê jî di warê zanist û ol de li zanîngeha Bergen wergirtine. Dema ku li zanîngeha Bergenê dixwend, seroka Yekîtiya Xwendekarên Kurdistanê bû. Lineva çalakvana sivîl û bandoerkera torên civakî ye.

**Bêkeş Takouk** welatiyê Almanyayê ye û xelkê Kurdistanê ye. Li Zanîngeha Goethe ya Frankfurtê di warê civaknasiyê de bawernameya masterê wergirtiye. Çend salan wek rêvebirê projeya perwerdeya siyasî li kurdische Gemeinde Deutschlamd e.V (Civaka Kurd li Almanya) kar kiriye. Di pirojeya perwerdeya siyasî de bi awayekî aktîf beşdarî gelek semîner û civînên girêdayî Kurdistanê bûye û li ser vê mijarê gotar nivîsandine. Herwisa ji bilî beşdarbûnê, wê bi xwe çend semîner organîze û moderatorî kirine. Bêkeş di van deh salên borî de jî bi xwebexşî beşdarî proje û çalakiyên kurdan li Almanyayê bûye.

**Xunav Haco** ji Rojavayê Kurdistanê ye û li Almanya dijî. Ew çalakvan û nivîskare. Endama Encûmena Niştimanî ya Kurdî li NRW bûye. Di heman demê de rêvebira komeleya Ronahî ye li bajarê Bochum. Ew perwerdekara civakî ye û di vê biwarê de xwedî bawername ye. Herwisa (1996-2000) li zanîngeha Bochum di biwarê lêkolîna jinan de (Jin di çand û siyaset de) ders xwendiye. Ji 1990 heta 1995 li beşa Kurdî ya WDR li Dortmundê xebitiye. Di sala 1992 Koma navneteweyî ya Xebata Jinan ji bo alîkariya jinên Kurd ava kiriye. Endama Platforma Jinên Kurd e ji sala 1994 heta îro. Endama Dêra Jinan a Bochumê (2006 - 2013) bûye. Damezrîner û birêvebera fêrgeha Ziman a WIS li Bochum bûye. Herwisa damezrînera komeleya Rewşen Bedirxan (yeketiye jinên Kurd-Alman) e

............................................................................................................................./ .... 2

**Sîrwan Rênas** lêkolînerekî serbixwe yê Kurdistanî ye. Gotarên wî yên bi zimanê kurdî, weke:

Qeyranî Nasinamey Neteweyî Le Bizûtnewey Kurdistan Da, û Dêmukratîzekirdinî Dêmukrasî; Rexine Le Binemakanî Tiyorî Dêmukratî Le Goşenîgay Netewe Bêdewletekanewe hene. Sîrwan xwediyê du bawernameyên masterê di warê zanistên siyasî û xwendinên navneteweyî (lêkolînên cîhanî) de ye. Niha ew xwendekarê diktorayê zanstên siyasî ye li Zanîngeha Pennsylvania. Qadên lêkolînên wî yên hezkirî teoriya siyasî, neteweperestiya lîberal, teoriya demokratîk, serxwebûn (cudabûn), dadweriya axê û lêkolînên sînor in. Rênas organîzatorê xelata Jemal Nebez e.

**Şano Meto** li Şengalê ji dayik bûye di sala 1986an de. Di sala 2010an de ji peymangeha hunerên ciwan a Silêmaniyê bi pileya yekemîn li ser asta peymangehê, ji beşa şanoyê liqa derhêneriya şanoyê derçûye. Di 2013an de bûye damezrênerê duyemîn ê navenda Yogayê li seranserî Iraqê û herêma Kurdistanê û sê salan wek mamosteyê Yogayê û rêvebirê navendê xebitiye; Yoga daye nasandin û belav kiriye. Nivîskarê deq û tekstên şanoyî, çîrok û senaryo, hozan û lêkolerê olî û ferhengî ye. Wek lîstikvan, derhêner û nivîskar di çendîn karên şanoyî û filîman de bûye xwedî roleke sereke. Bi giştî zêdetirî 50 karên wî yî hunerî hene. Wek lêkolînerê olî û bi taybetî li ser doza bawerî û olên kurdî dixebite. Vêga rêvebirê saziya Rêya Piranî ye li Almanyayê ku sala 2023yan destûra fermî wergirtiye li bajarê Biefeldê.

**Fexriye Adsay** ji bakurê Kurdistanê ye, niha li Amedê dijî. Lîsansa xwe ji beşa dîrokê ya Zanîngeha Rojhilata Navîn a Teknîk a li Enqereyê wergirtiye. Ji beşa sosyolojî, Zanîngeha Dicleyê ya li Diyarbekirê û beşa dîrok û zimanê kurdî ya Zanîngeha Mêrdînê Artukluyê master wergirtine. Edîtor, nivîskar û wergêra kovara *Zarema*yê ya rexne û teoriyê ye. Kovara 16 hejmar derketine di navbera salên 2014-2022an de; niha wek kanaleke youtubê (Kovara Zarema) bi hevpeyvînan weşana xwe didomîne. Heta niha bi dehan kitêb û gotar wergerandine ji îngilîzî bo tirkî û kurdî. Wergerên wê yên dawî tenê bi kurdî derbarê dîroka siyonîzm û Israîlê ne û xebatên xwe yî wergerê didomîne. Mijara sereke ya pê elaqedar dibe neteweperweriya kurdî ye. Vêga Koordînatora Xelata Jemal Nebez a Weqfa Jemal Nebez e ku du salan carekê tê dayin.